RÊVEBERIYA XWESER

LI BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYEYÊ

DESTEYA PERWERDE Û FÊRKIRINÊ

# MUZÎK

## SERETAYÎ

## 3



2019/2020

# MUZÎK

## SERETAYÎ

## 3

2019/2020

## AMADEKAR

Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Muzîkê ve hatiye amadekirin.

## LÊVEGER

- Komîteya Şopandinê
- Komîteya Fotoşopê
- Komîteya Redekteyê

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


STRANA SERÊ MALÊ ---------------------------------------------------------------- 7

PÊLEKANA MUZÎKÊ ---------------------------------------------------------------- 8

RAHÊNANA RÎTMÎ ----------------------------------------------------------------11

XECXECOK --------------------------------------------------------------------------12

PILEYA YEKPAR ----------------------------------------------------------------------13

RAWESTEKA YEKPAR -------------------------------------------------------------14

TERAZÛYA ÇARLÊDAN ---------------------------------------------------------15

DAHOL ------------------------------------------------------------------------------------17

STRANA DÊYA MIN-----------------------------------------------------------------18

RÎTM Û AWAZA KOMÎ -------------------------------------------------------------19

NÎŞANEYA (DUPAR) SPÎ ----------------------------------------------------------20

RAWESTEKA YEKPAR -------------------------------------------------------------21

RAHÊNANA MUZÎKÎ 1 -------------------------------------------------------------22

TERAZÛYA SÊLÊDAN ---------------------------------------------------------------23

RAHÊNANA MUZÎKÎ 2 -------------------------------------------------------------24

STRANA TÛZIKÊ ---------------------------------------------------------------------25

TEŞEYÊN MUZÎKÎ---------------------------------------------------------------------26

NÎŞANAYÊN BÊDENG --------------------------------------------------------------27

STRANA WERE KEKO TU ZANÎ -------------------------------------------------29

ZIRNE -------------------------------------------------------------------------------------30

TERAZÛYA DULÊDAN ----------------------------------------------------------31

PILEYA DO$_1$ -------------------------------------------------------------------------32

RAHÊNANA SOLFAYÎ --------------------------------------------------------------33

STRANA EZ XELEF IM --------------------------------------------------------------34

Wane 1

# STRANA SERÊ MALÊ


Serê mala'm darek lê lê darek lê
Serê mala'm darek lê lê darek lê
Binê mala'm darek lê lê darek lê
Binê mala'm darek lê lê darek kê
Her malek da yarek lê lê yarek lê
Her malek da yarek lê lê yarek lê
Her xanek da yarek lê lê yarek lê
Her xanek da yarek lê lê yarek lê
Serê yarê şarek lê lê şarek lê
Serê yarê şarek lê lê şarek lê
Serê yarê şarek lê lê şarek lê
Serê yarê şarek lê lê şarek lê
Serê mala'm darek lê lê darek lê

Serê mala'm gûzek lê lê gûzek lê
Serê mala'm gûzek lê lê gûzek lê
Binê mala'm gûzek lê lê gûzek lê
Binê mala'm gûzek lê lê gûzek lê
Her malek da qîzek lê lê qîzek lê
Her malek da qîzek lê lê qîzek lê
Her xanek da qîzek lê lê qîzek lê
Her xanek da qîzek lê lê qîzek lê
Serê qîzê zêrek lê lê zêrek lê
Serê qîzê zêrek lê lê zêrek lê
Serê qîzê zêrek lê lê zêrek lê
Serê qîzê zêrek lê lê zêrek lê
Serê mala'm gûzek lê lê gûzek lê

(Ji folklora kurdî)


# PÊLEKANA MUZÎKÊ

Pênc xêzên asoyî ne ku di navbera wan de çar valahî hene. Ji jêr ber bi jor ve tên jimartin û pileyên muzîkê li ser wan tên nîgarkirin.





Pileyên ku li ser xêzikan tên nîgarkirin

Mî - Sol - Sî




Pileyên ku di valahiyan de tên nîgarkirin


Fa - La - $Do_1$




Pileya "Rê": Li binê xêza yekem tê nîgarkirin.




Pileya "Do": Li ser rastekeke (xêzeke) veşartî li binê pêlekanê, tê nîgarkirin.



# RAHÊNAN

1. Bersiva rast hilbijêre:

Pileya "Do" li ser xêza………… tê nîgarkirin

a. Yekem
b. Veşartî
c. Çarem

Pileya "Rê" li binê xêza………… tê nîgarkirin

a. Yekem
b. Duyem
c. Pêncem

Pileya "Sol" li ser xêza……........... tê nîgarkirin

a. Yekem
b. Duyem
c. Sêyem

2. Bi hevalên xwe re beşa yekem ji strana "Serê Mala'm" bistirên.


Wane 3



# RAHÊNANA RÎTMÎ

"Rê - Mî - Fa - Sol - La"

1. Em navên pileyên muzîkî li bin wan binivîsin.




2. Em pileyên muzîkî li ser pêlekanê nîgar bikin.



Mî Fa La Sol Rê    Sol La Mî Rê Fa

Wane 4

# XECXECOK

Xecxecoka buharî
Bixemlîne vî warî
Zarok bi te kêfxweş in
Ew jî wek te rûgeş in



Tu kulîlka şîrîn e
Perwana li xwe dicivîne
Dema ku em te dibînin
Wênê te em dikşînin

Cihê min mêrg û zevî
Li ber sûlav û cê avî
Salê carek mêvan im
Li nava genim wek al im


(Fîxan Hîmo)

Wane 5


# PILEYA YEKPAR

- Her pileyeke yekpar yeksanî çar demên bilêvkirina (Ta) ye.

- Pileya yekpar bi çepik û bilêvkirina (Ta) re bi kar bîne:



- Her pileyeke yekpar yeksanî du nîşaneyên demê, yên spî û çar nîşaneyên demê, yên reş dike.






Wane 6

# RAWESTEKA YEKPAR


❖ Rawesteka yekpar, tê wateya çar demên bêdengiyê.



❖ Pênûsa xwe di ser van xalan re bibin, heta ku teşeya rawestekê bê bidestxistin:




❖ Vê rahênanê bi rîtmî bi lêv bikin, terazû û rawestekê jî di ber çavan re derbas bikin:




Wane 7


# TERAZÛYA ÇARLÊDAN

Ka em bi hev re, vê rahênanê bi lêv bikin.





Em bi hev re rîtmên vê rahênanê, bi nîşaneya terazûyê bi lêv bikin:



# RAHÊNAN

Em navên têgehan bigihînin sembolan:


Terazûya çarlêdan



Yekpar



Rawesteka yekpar



Wane 8

# DAHOL

Dahol, amûreke rîtmî ya muzîkê ye û ji demên pir kevn de, tê nasîn. Ji tareke girover a darîn û ji her du aliyan ve, bi çermê lawiran tê pêçan, pêk tê. Bi du daran, yek stûr û yek zirav, tê lêdan.



Wane 9

# STRANA DÊYA MIN



Hêja ye pir dêya min
Çi dayîkek dilovan
Hezkirina wê ji bo min
Nayê pîtav û pîvan
Min evîn tev civandin
Yên li erd û li ezman
Min ew kirin terazû
Pir sivik bûn, çûne ban
Evîna dayîka min
Nehat kêşan û taydan
Her dima li fera jêr
Tenê ew bû ya giran


(Salihê Heydo)

Wane 10


# RÎTM Û AWAZA KOMÎ

- Em bi awayekî komî, vê rahênanê pêk bînin.
- Em xwe dabeşî çar grûpan bikin û bi hev re, em rahênanê bi bikaranîna amûran, bixwînin:

## Rahênan 1




## Rahênan 2




Wane 11

# NÎŞANEYA (DUPAR) SPÎ 

❖ Her nîşaneyeke spî, yeksanî du deman e.




Em vê rahênanê bi awayekî rîtmî pêk bînin û li çepikan bidin:



Wane 12

# RAWESTEKA YEKPAR

- Dema ku em nîşaneya rawesteka yekpar bibînin, em bi qasî du deman, bêdeng dimînin.





Em bi hev re, vê rahênanê bixwînin û li çepikan bidin:



Wane 13

# RAHÊNANA MUZÎKÎ 1

❖ Em bi hev re, vê rahênana solfayî bixwînin:




❖ Em heman rahênanê li ser pêlekana muzîkî, nîgar bikin:







Wane 14

# TERAZÛYA SÊLÊDAN

❖ Em bi rêya tevgera dest, fêrî bilêvkirina terazûyê, bibin:





❖ Em bi hev re, rahênanê bi rêya tevgera dest, bixwînin:




Wane 15

# RAHÊNANA MUZÎKÎ 2

- Em bi hev re vê rahênana solfayî, bixwînin:



- Em pileyên muzîkî, di dema sêyem de li ser pêlekanê, nîgar bikin:



Wane 16

# STRANA TÛZIKÊ



Tûzik li ser ava ye
Av li binya mala ye
Pîr nexweş e bela ye
Tûzik dermanê dila ye



Baranê rêşerêşê
Pîr nexweş e zaif dêşê
Tûzik di dev de, bigivêşe
Tûzik dermanê, dilêş e

Rêya tûzik ne dûr e
Gola wê jî ne kûr e
Tûzik Mendik, hê hûr e
Derman e bêqisûr e


(Dîkran Melîkyan)

Wane 17

# TEŞEYÊN MUZÎKÎ

| **Nav** | **Teşeya pileyê** |
|---|---|
| Yekpar |  |
| Pileya spî |  |
| Pileya reş |  |
| Bidiran |  |

- Em bi rêya tevgera dest, bixwînin:



Wane 18


# NÎŞANAYÊN BÊDENG

- Nîşaneyên bêdeng ên muzîkê:




- Em pileyên muzîkî bixwînin û li gor her pileyekê, em demekê rawestin:


Yekpar : 4 dem – Nîşaneya dema yekpar




Pileya spî : 2 dem – Nîşaneya dema pileya spî



Pileya reş : 1 dem – Nîşaneya dema pileya reş




Pileya bidiran : 1/2 dem – Nîşaneya pileya bidiran




**Têbînî:** Nîşaneya bêdeng a pileya reş, vê teşeyê digire nava xwe: 

## RAHÊNAN

❖ Em navên pileyan bigihînin sembolên wan:

Dupar 

Yekpar 


çarpar 

❖ Bersiva rast hilbijêre:


A. Rawesteka yekpar:



B. Rawesteke dupar (nîşaneya spî)



C. Rawesteka çarpar (nîşaneya reş)



Wane 19

# STRAN WERE KEKO TU ZANÎ

Were keko tu zanî
Ji derdara dermanî
Çi ye welatê kurda lo
Şîrînê Kurdistanî



Were keçê tu zanî
Ji derdara dermanî
Çi ye welatê kurda lo
Şîrînê Kurdistanî

Gur ket di nav van pezên me
Xayin pir in di nav me
Ev çawa hez kirine lo?
Tu nabînî halê me

(Eyşeşan)

Wane 20

# ZIRNE

- Amûreke ji amûrên pifikî ye, gelê kurd ji demên kevn de, di dîlan û şahiyên xwe de, bi kar tînin.




Wane 21


# TERAZÛYA DULÊDAN

- Em bi hev re vê terazûyê bi rêya tevgera dest, bi lêv bikin:





- Vê rahênanê bi hev re û bi tevgera destên xwe, bixwînin:




# PILEYA DO$_1$

- Em bi rêya tevgera dest, pileya ( Do$_1$ ) bixwînin.
- Di rêya deng de, em cudahiya (Do) ji (Do$_1$) binasin.
- Em bi hev re rahênanê di rêya tevgera dest û deng re, bi lêv bikin.






Wane 23

# RAHÊNANA SOLFAYÎ

- Rahênana Solfayî li gorî terazûya dulêdan, sêlêdan û çarlêdan.

- Em vê rahênanê bi tevgera dest re û bi awayekî rast, bixwînin:



Wane 24

# STRANA EZ XELEF IM

Ez Xelef im Xelef im
Hewar e mîr hewar e mîr
Êzdînşêr mîrê Botan e
Xwediyê şûrê b' sedef im
Hewar mîr hewar e mîr
Xwediyê şûrê b' sedef im
Êzdînşêr mîrê Botan e
Li nav eşîran bigef im
Hewar mîr hewar e mîr
Li nav eşîran bigef im
Êzdînşêr mîrê Botan e
Ez Xelefê kinik im
Hewar e mîr hewar e mîr
Ez Xelefê kinik im
Êzdînşêr mîrê Botan e



(Folklorê Kurdî)

## BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| Heftî / Meh | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | Strana Serê Malê | Pêlekana Muzîkî |
| Cotmeh | Pêlekana Muzîkî | Rahênana Rîtmî | Xecxecok | Pileya Yekpar |
| Mijdar | Rawesteka Yekpar | Terazûya Çarlêdan | Dahol | Strana Dêya Min |
| Berfanbar | Rîtm û Awaza Komî | Nîşaneya (Dupar) Spî | Rawesteka Yekpar | Rahênana Muzîkî 1 |
| Rêbendan | Lêveger | Nirxandin | Bêhinvedan | Bêhinveda n |
| Reşemeh | Terazûya Sêlêdan | Rahênana Muzîkî 2 | Strana Tûzikê | Teşeyên Muzîkî |
| Avdar | Teşeyên Muzîkî | Nîşaneyên Bêdeng | Strana Were Keko Tu Zanî | Zirne |
| Cotan | Terazûya Dulêdan | Pileya $Do_1$ | Rahênana Solfayî | Strana Ez Xelef im |
| Gulan | Lêveger | Nirxandin | | |